Dr Ali KILIC

Dawlat -e Jumhouriye Kurdistan

FLAG OF THE KURDISH REPUBLIC OF MAHABAD

Dîroka hemû Kurd û Kurdistan ê

FROM THE PROCLAMATION OF THE KURDISH REPUBLIC OF MAHABAD, January 22, 1946

Paris 22 çele 2009

Lî dîroka gele meye Dersim û Kocgiri de, 21 adar sala 1921 de Sazkirina Komara Serxwebuna Kurdistan a Kocgiri bo soreşa Dersim, diji dewleta imperialista tirk, tekoşina Sex Maxmoud Berzenci diji imperializme ingilizi bo Kurdistan Serxwabun, giredaiyé tekoşina soreşgeriya PDK ïranê û bo avakîrina Komara Dawlat –e Jumhouriye Kurdistan? Birez Kakshar li ser rewsa we bach got

« Roja 22. çileya sala 1946 an li rojhilatê Kurdistanê di meydana Çiwar Çira ya bajarê Mehabadê da bi merasimeke taybetî komara Kurdistan ji aliyê Pêşewa Qazî Mihemed ve hat îlan kirin. Di wê roja pîroz da zêdetir ji 20000 kes beşdar bibûn û ji parçên din yên Kurdistanê jî Kurd tevlî pîrozbayî bibûn. Pêşewa Qazî Mihemed pişti ku bi dûr û dirêjî li ser dîroka Kurdistanê axivî, bi denegkî bilind wiha got: » [1]

“Emin be Xuda, be kelamî ezîmî Xuda, be nîştiman, be şerafetî millî Kurd, be alay muqedesî Kurdistan siwênd dexûm ke ta axir henasey giyanim û rijandinî axirîn qetrey xiwênim, be giyan û be mal le rêy ragirtinî serbexweyî w berzkirdinewey alay Kurdistan da, têbikûşim û nisbet be cimuhrî Kurdistan û yekitî gelî Kurd û Azerbayicanê, mutî□î û wefdar bimênim.

Ez bi Xwedê, bi kelama ezim(mezin)a Xwedê, bi nişтiman, bi şerafeta netewa Kurd, bi ala muqedesa Kurdistanê sond dixûm ku heya nefesa canê xwe ya dawiyê û rijandina dilopa xwina xwe ya heri dawiyê, bi can û mal di riya ragirtina serxwebûn û bilindkirina ala Kurdistanê bixebitim û nisbet bi komara Kurdistan û yekitiya gelê Kurd û Azerbayicanê, muti i û wefadar biminim.” Piştre endamên kabîneya wezîrên dewletê bi vî şêweyî hatin diyar kirin: Hacî Babe Şêx: Serokwezîr 2. Mihemed Husên Xanî Sêyfî Qazî: Wezîrê Ceng û parastin û hevkarê serokkomar. 3. Sidîq Heyderî: Wezîrê propagande û ragehandinê. 4. Menaf Kerîmî: Wezîrê Perwerde û hînkariyê. 5. Mihemed Emîn Mo□înî: wezîrê karê hundurîn (Wezîr navxwe). 6. Seyîd Mihemed Eyyûbyan: Wezîrê Tendurustiyê 7. Ehmed Îlahî: Wezîrê Aborî(Êkonomî). 8. Xelîl Xusrewî: Wezîrê Kar 9. Kerîm Ehmedyan: Wezîrê post û têlêgiraf 10. Hacî Mistefa Dawûdî: Wezîrê Bazirganiyê 11. Mela Husên Mecdî: Wezîrê dadperweriyê 12. Mihemed Welîzade: Wezîrê kiştûkal(çandiniyê). 13. Hacî Ebdulrehman Îlxanîzade: Wezîrê Tegbîr û meşweret pêkirinê 14. Îsmaîl Îlxanîzade: Wezîrê rê û ban.

[1] **Kakşar Oremar,59MÎN SALROJA DAMEZRANDINA KOMARA KURDISTAN PÎROZ BE** ,

Bi Hinceta 63'emîn Salvegera Avakirina Komara Kurdistanê , PDK Îranê Piştî hiloşîna rejîma dîktator ya Rizaxan û hatina hêzên hevalbend di şerê duyemîn yê cîhanî de ji bo Îranê û ew rewşa siyasî ku di Îranê de pêk hat, bizava nîştimanî û demokratîk ya Îranê û tevgera rizgarîxwaz ya neteweyên Îranê çû nava qonaxeke nû. PDK Îranê jî ji wê delîveya hêja û baş mifah stand û di roja 22'ê Rêbendana sala 1324'ê Rojî(22.01.1946'an) de, di rê û resmeke hêja û berfireh de, bi beşdariya xelkê bajarê Mehabadê û bajarên din ên Kurdistanê, kesayetiyê jêhatî û navdar yê gelê Kurd, Pêşewa Qazî Mihemed, rêberê PDK Îranê di qada Çarçira ya bajarê Mehabadê de, bi hesteke pîroz ya welatparêzî ve Komara Kurdistanê hate îlankirin û şabûn û kêfxweşî xiste nava dilê tev welatparêzên Kurd li hemû parçeyên Kurdistanê. Bi damezrandina Komara Kurdistanê xortên şoreşvan ên Kurd, ji parçeyên din yên Kurdistanê rû kirine Komara Kurdistanê û xwe gihîjandine bajarê Mehabadê, Qibleya hêviyên Kurdan. Beşdariya wêrane û bibandor ya Barzaniyan bi serokatiya xebatkarê neteweya Kurd, Mistefa Barzanî ku di Komara Kurdistanê de bi sedema xebat û tekoşîna tejî serwerî û serbilindî, pileya Jeneraliyê jê re hate bexşîn, di xizmetkirin bi armancên Komarê û parêzvanîkirin ji destkevtên neteweyî û nîştimanî yên Komara Kurdistanê de roleke girîng û berbiçav hebû û dîrokeke tejî serfirazî û rûmetê ji bo xwe û gelê Kurd tomar kir û bûn bi remz û sembola berxwedaniyê li hember dujminên Kurd û Kurdistanê de. Her wiha beşdariya çend kes ji Efserên weltparêz û azadîxwaz ên Kurd ji Kurdistana Başûr bi navên Mistefa Xoşnav, Xêrula Ebdulkerîm, Mihemed Mehmûd û Izet Ebdolezîz di Komara Kurdistanê de cihê hêja û taybet yê xwe heye û hatina wan di dîroka Komara Kurdistanê de wekî helwesteke welatperwerane hatiye tomarkirin û xizmetên wan ên neteweyî ji bo tev xortên Kurd cihê rûmetê ne. Ji bilî vana, azadîxwazên Kurd ji Kurdistana Sûriyê û Turkiyê û heta qasekê ji YekîtiyaSoviyeta berê jî seredana Komara Kurdistanê kirin û piştevaniya xwe ji vê desthilata netewî xuya kirin û bi awayê cur bi cur xizmet bi armancên Komarê kirin. Her ev piştevaniya bênimûne ya gelê Kurd bû ku birêveberên Komara Kurdistanê bi dilgermiyeke zaf dest bi kar û tekoşînê kirin û Komara Kurdistanê di ew temenê demkurt yê xwe de, karî xizmeteke mezin û berbiçav ji neteweya Kurd re bike û beşek ji hêviyên kevnar û dîrokî yên gelê Kurd cî bi cî bike, siyaset û metodên birêvebirina erkên xwe li gorî pîvanên civaka pêşverû berçav bike. Ji aliyekê tevî gelên azadîxwaz ên cîhanê têkiliyan çê bike û ji aliyekî din ve bi gelên rizgarîxwaz yên Îranê re pêwendiya dostaniyê ava bike û peymana alîkarî û hevxebatiyê bi wan re girê bide. Peymana dostanî û alîkariya her du Komarên Kurdistanê û Azerbaycanê di dîroka xebata azadîxwaziya her du neteweyên Kurd û Azerî de mînakeke berçav û hêjayî rûmetê ye. Herwiha tevî tevgera azadîxwaziya Îranê û hêzên siyasî têkiliya dostîniyê çê kir û ji bo parastina destkevtên siyasî û demokratîk ên tevgera azadîxwaziya Îranê hevkarî kir. »[2]

[2] Agirî, hejmar 56, 31'ê January 2007

Mîn bî zîmane fransîzî û ingilizî li ser Malpera PEN KURD li ser kritere ethik û feylesofikên 63 emîn Salvegera Avakirina Komara Kurdistan analiz kîr. Jiyan û Xebata Pêşewa Qadî Mihemed, heviye meye. Pewiste ku, gele meye Kurdistan, hemu gelên diné cîhe Qadî Mîhemmed bîzanin. Zaroken, xorten, jinen, meren Kurdistan fikren Qadî Mihemmed ‘re ilham bî gîrîn bî zanîn ku tekoşina wî, prinsiben wî,idféalé wî, sazkîrîna Dawlat-ê Jumhouriye Kurdistan ê/ Di pêşsibêdeya 10’ê Xakelêweya sala 1326(30.03.1947)’an de, Pêşewa Qazî Mihemed, Mihemed Hesen Xanê Seyfê Qazî(kur mamê Pêşewa) û Ebulqasim Sedrê Qazî(birayê Pêşewa) piştî hukim dan li du dadgehên neadilane û rûyekî de bi destê gemar û qirêj yê neyarên gelê Kurd li Çar Çiraya bajarê Mehabadê, yanî her li wî cihî de ku li 2’ê Rêbendana 1324(22.01.1946)’an de Komara Kurdistanê tê de hatibû ragihandin, hatne îdam kirin û şehîd bûn, û her di vê rojê de li ser milê xelkê biemeg û bi şeref yê Mehabadê di goristana Mela Camî de hatine veşartin. Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê li 10’ê Xakelêweya sala 1358(30.03.1979)’an ev roje weke **Roja Şehîdên Kurdistanê** îlan kir. Heke di pêş wê demê de li ber zext û givaşên kirêgirtiyên Şahê dîktator, azadiya lidarxistina rê û resmê bi vê hincetê nebû, lê piştî hilweşîna rejîma Paşayetiyê û bi taybet piştî wê ku PDK Îranê ev roje bi vî navî nasand, hemû salê di roja han de rêz û hurmet ji hemû şehîdan û pêşengê wan Pêşewa Qazî Mihemed tê girtin.

Rast e Pêşewa Qazî Mihemed Serok Komarê Kurdistanê û kesayetiyê herî navdar yê Mukiryanê bû û di hemû deveran de naskirî bû. Lê piştî derbasbûna çend salan li ser şehîdbûna wî jî ji bo gelê Kurd bi awayê hewce nehatibû naskirin, yan jî heke naskirî ba, mîna dema niha ku rêz û hurmet jê tê girtin, qedir lê nedihate girtin. Hewce ye gelek pitir ji vê hindê lêkolîn li ser kesayetiya Pêşewa bihê kirin, heta bi vî awayê ku hêjayê wî ye, bihê nasandin. Qazî Mihemed kurê Qazî Elî yê kurê Mîrza Qasimê Qazî ye. Derbasbûyiya vê malbatê li bajarê Sablaxê bi 400 salan berî niha vedigere. Ewne tenê ji aliyê xelkê ve, belkî ji aliyê desthelatdar û berpirsên hikûmetî jî ciyê rêz û hurmetê bûn.

Qazî Elî bavê Pêşewa, li sala 1930’an li Mehabadê de Rêxistineke kurdî bi navê “**Bizava Mihemed**” pêk anî. Navhatî tevî şoreşa Şêx Mihemed Xiyabanî di Tewrêzê de têkilî hebû, heta sala 1934’an jî ku koça dawiyê kir, li ser vî karî berdewam bûye. Qazî Elî xwediyê du zarokan bûye, yek ji wan Ebulqasim Qazî naskirî bi Sedrê Qazî bûye ku yek du geran ji aliyê xelkê ve bûye nûnerê Parlemanê û hitbar û nifûzeke taybetî hebûye. Piştî bi dawî hatina dewrana nûnerayetiya xwe, li ser pêşniyara Pêşewa, bo cî bi cî kirina kar û barên siyasî û hevkarî kirin tevî xelkê her li Tehranê mabû. Qazî Mihemed jî ku di sala 1900’an di vê malbata qedirgiran û bi ferheng de ji dayîk bûye, her li destpêka ciwaniya xwe de hizr û hesta nîştimanperweriyê tê de xurt bûye, pir hez ji xwendina zanista kevn û taze hebûye û gelek zû di vî warî de pê elimiye û gelek cehd kiriye ku zimanên biyanî ji hîn be. Ji bilî zimanê Erebî, Farsî û Kurdî, tevî zimanê Fransî, Îngilîzî û heta qasekê Rûsî jî nasyarî hebûye.

Qazî Mihemed gelek hez bi hatin û çûn û têkilî tevî alîgirên zanistê û şareza û Mêrxasan, Kurdên Welatperwer û Serok hoz û eşîran hebûye. Piştî mirina babê xwe bûye dadmendê bajarê Mehabadê. Li ber hezkirina zaf bi karê çandî û pêşdebirina zanist û agahiya xelkê, di salên beriya sala 1941'an û piştre jî bo yek du salan berpirsyariya îdareya çand ya bajarê Mehabadê li stû girtiye û xizmeteke zaf ya çandî kiriye. Li dema berpirsyariya wî de, yekemîn xwendingeha keçan li Mehabadê hatiye vekirin. Her di vê derheqê de tevî zaf ji xwendekar, rewşenbîr û mamostayan de pir nêzîk bûye.

Qazî Mihemed rêz û hurmeteke xasmanî ji bo damezirînerên **Komeleya J-K** (Vejiyana Kurd) hebûye. Di çend salên dewrana bê hikûmetiyê de jî yanî salên 1941-1945'an ku Komara Kurdistanê pêk hatiye, di birêveçûna kar û baran de û nemaze di çareserkirina pirsgirêk û arîşeyên eşîreyan de roleke berçav hebûye. Gelek ji demezirînerên **J-K**'ê rawêj û şêwir tevî Pêşewa Qazî Mihemed kirine û gelek jê hez kirine û zor hewil didan ku bibe endamê "J-K"ê. Gelek ji pirs û arîşeyên karî ên rojaneye xelkê li dîwana wî de ku jêre digotin **"Mehkeme"** dihatne çareser kirin. Qazî di ditîngeha nûnerên biyaniyan jî ku wê demê welatê Îranê di navbera xwe de parve kiribûn, rêz û hurmeteke taybetî hebû. Her kes ji bo Mehabadê çûye, cehd kiriye berê her kesekê wî bibîne. vexandina wî ji bo Yekîtiya Soviyetê her di vê derheqê de bûye, ku bi şandeke mezin re çûye Bakoyê. Qazî Mihemed ku bû bi endamê "Komeleya J-K" û navê nepenî yê **Bînayî** jêre hate diyarî kirin, hêviyek zêdetir xiste nav dilê gel û berpirsan de.

Di encama têgihîştina bi wext û cesûriya siyasî ya wî û bi qinaet gihîştina (qebûlkirina) berpirsên Komeleyê de bû ku **J-K** bû bi Partiya Demokrat a Kurdistanê û wek Partiyeke Demokrat û pêşverû dest da xebat û tekoşînê. Qazî ji ber hurmeteke taybet ku ji bo "J-K"ê hebû, roja avabûna PDK jî her bi 25'ê Gelawejê, roja avabûna "J-K"ê îlan kir û bi vî awayî bala piraniya berpirsan ji bo aliyê tekoşîn di nava PDK rakişand. Partiyê bi xurtî ta û çiq avêtin û tekoşîna wê di hemû deverên azad yên Kurdistanê de pêş ket. Partiya Demokrat pirsgirêka bi darê zorê zeliqandina Kurdistanê bi Azerbaycanê verevand û neçar kirin ku hesabeke cuda ji bo Kurdistanê bikin.

Piştî pêkanîna Kongireya yekemîn, li 2'ê Rêbendana 1324 (30.03.1946)'an de, bi pişikdariya nûnerên parçên din ên Kurdistanê û Mela Mistefa Barzanî û Serok Eşîr û nûnerên hemû cih û taxên Kurdistanê, pêkhatina yekemîn Komara Kurdistanê hate îlan kirin.

Ger heta vê gavê car caran di Rojnameya **Kurdistan** de qala navê **Pêşewa** dihate kirin, piştî damezirandina Komarê bi awayekî fermî nasnavê Pêşewa pê hate bexşîn û ew nave hetanî niha jî di nava kom û civatên xelkê de her meşhûr e.

Pêşewa mirovekî gelek bi ferheng, dilsaf, xweşqise, evîndarê wêje û hunerê, ravêjker, di heman demê de miroveke siyasî û demokrat, welatparêz û evîndarê gelê xwe bû. Tevî hemû tex û çînekê rabûn û rûniştin dikir(tevdigeriya) û li dema hewce de ji hest û qaweta wan mifah werdigirt.

Qazî Mihemed biratî û hevgirtina Kurdan sedemên herî mezin yên serkeftinê dizanî. Ji ber vê çendê ye ku di piraniya gotar û nivîsarên xwe de ku di rojnameya Kurdistan ya wî çaxî de hatine weşandin, li ser pirsa yekîtî û biratiyê tekez kiriye û wekî merca serkevtin û bingeha ragirtina Komar û sedemên serkeftina bi ser dujminên gelê Kurd de zaniye.

Her çiqas dizanî ku dujminên gelê Kurd rast nakin, lê di gutûbêjan de gelek bi aşkira radigehand ku gelê Kurd hez dike bi awayekî aştiyane bigihîjne mafên xwe, lê ger wisa nebe, ewa ji dest bê, dê bike.

Eva hewce bû bi aşkera û bêtirs ji Şah û Qawam re ragihand, tilî li ser kêmasiyên wan li hember gelê Kurd daniye û ji wan re destnîşan kiriye. Bi eşkere jî digot, hûn di gotinên xwe de du dil in û hez nakin pirsa gelê Kurdistanê çareser bikin.

Demekê ku Pêşewa ji aliyê **Qewam El Seltene** ji bo Tehranê tê vexwandin û di bervara 28'ê Juena 1946'an diçe bo Tehranê, ji aliyên hejmarek ji wezîran, nûnerên Perlemanê û nûnerên Kurdên Tehranê û nûnerên Partiyan û Yekîtiya Karkeran di Balafirgehê de pêşwazî jê hate kirin. Rojnameya "Îranê Ma" (Îrana me) her vê demê dinivîse: **Niha ku Qazî Mihemad li Tehranê ye û azadîxwazan ew dîtiye, dê eyan bibe ku hizr û bawera wî pêkanîna azadî û demokrasiyê li gişt Îranê de ye û mafê civakî, siyasî û mirovî ji bo neteweya Kurd di holê de ye. Her karek ku bi qazancê demokrasiyê be, ji aliyê Pêşewayê Kurdistanê ve dê bi can û dil bihê pêşwazî kirin. Em hêvîdarin cenabê Qawam ji vê sefera dîrokî mifahê bistîne.**

Di dema xatir xwastinê tevî nemir Mela Mistefa Barzanî de, ew dibêje:**"Ez dê xwe gorî û fîdayê gelê xwe bikim û tu demekê weke Pîşewerî û Serokên Azerbaycanê nakim, heta welatê min bi xwînê bihê verdan û bi hezaran kes werin kuştin."**

Pêşewa û hevalên wî çiqas di heyamê 11 mehên Komarê cehd û bizav kirin, bi wî qasî jî di wan dadgehên rûyekî de ku ji bo mehkeme kirina wan hatibûne li darxistin, fîdakarî û dilêrî ji xwe nîşan dan.

Tevî wan hemû nerehetiyên derûnî û ew jiyana tal û nexweş ku di girtîngeha Padigana Mehabadê de, ji wan re pêk hatibû, ne tenê baweriya wan li dor Kurdayetî û azadiyê jar nebibû, belkû gelek tundtir û micidtir bibûn.

Wan di hevdîtineke nepenî de tevî yek du mirovên ciyê baweriyê, emir kirine:**”Wan em lêbandin, bila gelê Kurd nexape û xebata xwe ji bo rizgarî û serdestiyê bidomînin û çekê nedanên”**. Her wiha wan gotibû ku gelek zext û givaş xistin ser me hetanî ku em nameyekê ji Mela Mistefa Barzanî re binivîsin ku dest ji xebatê ber de. Lê em ne tenê karê wisa nakin, belkû em bawer in ewa ji dest wî bihê, divê tevî wan nemêran bike.

Cesûriya wan di dadgehan de bi qasekê bûye ku bibû ciyê ecêbmana Efserên dewletê. Di rastî de Amerîka û Îngilîz jî li pişta vê dadgehê bûn. Her çiqas ji bilî şolbidestên wan tu keseke biyanî lê nebûye, lê her ji rêya wan re gelek tişt belav bûne ku hewce dike em bizanin.

Pêşewa her carê di wan du keretên bi nav dadgeh kirinê de, pitir ji 4 seetan qise kiriye û bi gotina Serwan Şerîfî ku Parêzerê wî bûye, dibêje:”**Ewa Qazî Mihemed bû ku hikûmet mehkeme kiriye û di hemû warekê de hikûmet kişandiye jêr pirsyarê**”.

Rojnameya **Azadî** ku di wî serdemî de bi zimanê Kurdî li Bexdayê derdiket, derheq piştevaniya Amerîka û Birîtaniya di vê mehkemê de nivîsandibû: ”îstimara Amerîka û Îngilîstanê hebûna Qazî Mihemed û hevalên wî tirs û dijminê herî mezin yên xwe dizanîn wan hêvî hebûn, bikarin rêberê Komara Kurdistanê têk bidin û di girtîngehê de jî nûnerên wan dewletan çun û tevî Pêşewa û hevalên wî qise kiriye, bona vê çendê ku bikarin Qazî Mihemed û hevelên wî ji bo aliyê xwe rabikişînin, lê ew çi demekê serkevtî nebûn”. Piştre jî rojnameya **Azerbaycan** li Bakûyê de nivîsandibû, Qazî Mihemed ji nûnerê Amerîkayê (Curc Alên) re gotibû: **“Gelê Kurd li benda tu çakî û hevkariyekê ji aliyê welatên îstîmarî nine”**.

“Necefqulî Pesyan” axavtinên Pêşewa li dadgehê di çend hevokan de kurt dike û dinivîse: “Li dema dadgehî kirinê de Qazî Mihemad êrîşê dike ser siyaset û kiryarên dewleta Tehranê û digot: **“Ez di kuncê girtîngehê de dengê xwe bi dijî dewleta Tehranê û serokên wê bilind dikim û dibêjim hûn gunehbar in ne em, we welatê me dagîr kiriye”**. Rojnamevaneke din bi navê Silêman. X di nivîsên xwe de dibêje, Qazî got: “**Tevahiya ev serpêhat û bûyerane encama siyaseta dagîrker ya dewletê ye. Ger dewlet hemû Kurdan bi xayîn dizane, bila ji Kurdan vegerin, kar û barên xwe bi xwe bigirne destê xwe “.**

Di girove, belge û rojnemeyên Yekîtiya Soviyet a berê de gelek tişt di derbarê vê mijarê de hatine nivîsîn û ji zimanê Efserên Îranê ve bas dikin ku

Qazî gotiye: “**Ev bûyerane di encama vê çendê de bûye ku we bi xwe Qanûna Bingehîn bin pê kiriye. Niha jî ez tenê bi xwe demokrasiyê di Kurdistanê de xurt dikim û pêşde dibim û tu hêzeke biyanî haydarê min nebûye. Bêpar bûna gelê Kurd yê bûye haydarê min ji bo birêve birina wan kar û xebatane**.”

Dema ku serokê dadgehê yan Dozger wî bi îxanetkar gunehbar dike, di bersîvê de, Pêşewa dibêje: “**Wira mala min e, axa Kurdistanê axa bav û kalên min e, ez çawan dikarim dest ji welatê xwe berdim**.”

Ger yekemîn mehkeme di 19’ê meha Janviyê de dest pê kir û çend rojan dom kir û biryara Îdama Qaziyan da, mehkema duyemîn di 28’ê Marsa 1947’an yanî 7’ê Xakelêweyê dest pê kir û roja 30’ê Marsê dawî pê hat.

Kovara **Xebata Xwendekaran** hejmara 37’an di vê dawiyê de ji zimanê Serwan Kiyûmers Salihî, nûçegihanê Kovara Arteşê ku di dadgehê de bûye û piştre li ser nivîsîna raporekê di vê derheqê de tê girtin û salekê dikeve girtîngehê, çend hevok ji gotinên Pêşewa belav kiriye.

Pêşewa gotiye: “**Min ji mêj dem e xwe bo vê yekê amade kiriye, ez bi sîngeke vekirî pêşwaziyê ji vê mirina serbilindane dikim ku di rêya azadiya netewa xwe de tême kuştin. Eva sozek e ku min ji neteweya xwe re daye ku tevî wan bijîm û ji wan re jî bimrim, taze ez dê çawa amade bibim peymana xwe bişkînim û binpê bikim**.”

Her wiha Serwan Kiyûmers dinivîse: “Min di piraniya dadgehên meydanî û leşkerî de weke nûçegihan beşdarî kiriye, lê min qet tu kesek weke Qazî Mihemed biwêr û netirs nedîtiye. Wî di dema dadgehî kirinê de nedizanî tirs çî ye. Gelek mêrane û bêtirs qise dikir û bersîva pirsyaran dida.”

Her ev netirsî û xwe gorî kirina wî jî bû ku li jêr dara Îdamê rê neda çavên wî girê bidin û got: “**Ez hez dikim di demên dawîn yên jiyana xwe de bi serbilindî û çavên vekirî binêrme welatê xwe yê ezîz û xweştevî**.” Her wiha emir kir:

“Hûn Qazî Mihemedekê dikujin, lê bizanin li her dilopeke xwîna min Qazî Mihemedek dê şîn bibe. Ez daxwazê ji gelê Kurd dikim dest ji xebata xwe di pêxema azadiya Kurdistanê de ber nedin, baweriyê bi dewleta xwefiroş ya Tehranê nekin. Bijî Kurd û Kurdistan.”

Bi mezinahiya Xwedê, Rumetiya Kurana Kerîm, li ser Welat û ala min, ez sond diwxim

"Bi mezinahiya Xwedê, Rumetiya Kurana Kerîm, li ser Welat û ala min, ez sond diwxim, heta dilopa dawî ya xwîna min û nefesa min a dawî, bi can û Malê xwe, di rêya azadiyê de, ji bo alên me li azamanan pêl bidin, ezê têbikoşim..." **Q. M**

Di nava sedsala 20 an de, piştî hukumeta Başûrê Kurdistanê ku Şex Mehmûd Berzencî li Silêmaniyê îlan kir, Komara Kurdistan a Mahabadê, di warê dewletbûyinê de, ji bo Kurdan bû tecrûbeyek duyem. Lê belê, hin welat ji bo berjewendiyên xwe, Komara Mahabadê, feda kirin. Di 22'ê Çileya sala 1946'an de, berî 63 salan weke îro, bi alîkariya Yekîtiya Sovyetê, li Meydana Çarçira ya Mahabad, Komara Mahabadê ji aliyê Qadî Muhammed ve hate îlankirin. 13 wezîrên ku di komara Mahabadê de cih girtin, piştî demekê Desturabingehîn a komarê zelal kirin. Komara Mahabadê, her çiqas heta demek kin berdewam kir-jî di wê demê de, bû navenda siyaset û ronahiyê. Komara ku li Mahabadê hate sazkirin, ala netewî ya Kurdistanê hilda û Gel-jî, artêşa welêt sazkir. Hukumeta Komarê, herwiha rêxistinên aborî, civakî, edebî, hunerî û rêxistinên leşkerî-jî saz kir. Rojname û kovar derketin. Sistema birêvebir ya Komarê-jî hate sazkirin. Hewl hate dayîn ku sistema perwerde û ziman were pêşxistin. Zimanê Kurdî bi fermî hate qebulkirin. Şanoya Kurd hate sazkirin. Ji bo jin di aliyê siyasî û civakî de pêşbikevin, di 14ê Adarê de, Yekîtiya Jinên Kurdistan hate sazkirin. Jina Qadî Muhammed, Mine Xanim, di xebatên jinan de, roleke aktif leyist. Herwiha hewl hate dayîn ku têkiliyên diplomasî-jî werin xurtkirin. Bi kurtahî, herçend temenê Komara Mahabad kin be-jî, Mahabad di vê demê de bû navenda siyaset û rewşenbiriyê. Piştî îlankirina Komarê, Yekîtiya Sovyetê desteka ku dida Qadî Muhammed, paşve kişand û di 16'ê Mijdara sala 1946'an de, hêzên Artêşa Îranê Paytexta Azerbeycanê bi destxistin û ber bi Mahabatê ve meşiyan. Hêzên Rejîma Îranê, bi desteka Brîtanya, di 17'ê Kanuna sal 1946'an de, Komara Kurdistanê ya li Mahabatê hilweşand. Li Mahabatê di merasîma sazkirina Komara Kurdistanê de, Qadî Muhammed wiha sond xwaribû:

"Bi mezinahiya Xwedê, Rumetiya Kurana Kerîm, li ser Welat û ala min, ez sond diwxim, heta dilopa dawî ya xwîna min û nefesa min a dawî, bi can û Malê xwe, di rêya azadiyê de, ji bo alên me li azamanan pêl bidin, ezê têbikoşim"

Qadî Muhammed, Wezîrê Parastinê Muhemed Husên Seyfi Qazî û birayê wî Sadrî Qadî, li Meydana Çarçira ya ku Komara Mahabadê hatibû îlan kirin, di 31'ê Adara sala 1947'an de, hatin dardekirin.

Qadî Mihemmed (an Qadî Muhemmed) (* 1898, 1900 an 1901; † 30'ê adarê 1947 li Mahabad)sazûmankare Partîya Demokrata Kurdîstan a Îran ê û serokê Komara Mehabadê bû.

Qadî Mihemed lawê Qadî Elî ye û sala 1898’an li bajarê Mihabadê ji dayîk bûye. Bi Mîna Qadî ra dizewice. Le salî 1946 da le Mehabad Qadî komarî Mihabad'î damezrand. Piştî têkçûyîna hêza Kurd Qadî bi tevî rêvebirên komarê li Meydana Çarçira tên darvekirin.

Wesiyeta Qadî Mihemmed li gelê Kurd (ji arşîvên fermî yên Îranê hatiye bidestxistin)

Bi navê Xwedêyê mezin û dilovan;

Gelê minê kurd û birayên min ên hêja, birayên min ên behr xwarî, gelê min ê zorlêkirî, vame ez di gavên herî dawîn ên jiyana xwe de me, werin ji bo xatirê Xwedê êdî dijminayiya hev nekin û pişta xwe bidin hev, li hember dijminê zordest û zalim derkevin, xwe belaş mefiroşin dijminan, dijmin her ewqas we dixwaze tenê karê xwe bi we pêk tîne û qed bi we re dilovanî naket; di her fersendekê de be qed li we nabihure.

Dijminê gelê Kurd pir in, zordest û bê dilovanî ne, sîmbola serketina her gel û netewekê hevgirtin û yekbûn e, piştgiya tev gel e. Her gelê ku yekîtî û tebayiya wî nebe; ewê hertim bin destê dujmin be, ti tiştê we gelê Kurd ji gelên li ser rûkê vê erdê; ne kêmtir e, belkî hun bi mêranî û egîdî û hêjatiya xwe; ji gelên ku rizgar bûne; li pêştir in jî.

Gelên ku ji destê dujminên xwe yên zordest rizgar bûne; mîna we ne, lêbelê yekîtiya ên xwe rizgar kirine hebûye, bila hun jî mîna tev gelên li ser rûkê erdê; îdî bin dest nebin, her bi yekbûn û hesûdî bi hev nebirinê û xwe nefirotina ji dujminan re li dijî neteweya me; hun dikarin rizgar bibin, birayên min îdî bi dujmina neyên xapandin, dujminên Kurdan ji her reng û destek û netewekê bin, her dujmin e, bê dilovanî ye, bê wijdan e û rehmê bi we nake, wê we bi hevdu bide kuştin, wê we temah bike û bi direw û xapandinê; wê we berengarî hev bike, ji tev dujminên gelê Kurd, dujminê Ecem ji tevan zalimtir û melûntir û Xwedê nenastir û bê dilovantir e, destê xwe ji ti tawanan li dijî gelê Kurd naparêze, bi dirêjayiya dîrokê bi gelê Kurd re xerez û kîna wî ya kevnar hebûye û heye jî, temaşa kin, binêrin tev zilamên we yên mezin, her ji Simayîl Axayê Şikak, tanî Cewher Axayê birê wî û Hemze Axayê Mengur û çend û çendîn zilamên din, ew hemû bi xapandin aram kirin û xelq ji pişt wan vekir û ca pir bi nemerdî ew kuştin, ew tev bi sond û Quran xapandin ku xudêgiravî niyaza eceman ya xêrê bi wan re heye û wê qenciyê bi wan re bikin, lêbelê her xweşbawer e û bi sond û sozên Eceman hatiye xapandin û jê bawer kiriye, lêbelê tanî niha bi dirêjiya dîrokê kes nedîtiye bi tenê carekê jî ecem li sond û sozên xwe xwedî derketibe û ehdên dane Kurdan pêk bînin, tev de direw û xapandin bûye, ca vaye ez wek birayek we yê biçûk, di riya Xwedê de, ji bo xatirê Xwedê ji we re dibêjim hev bigirin û ti carî pişta hev ber medin, piştrast bin ger ecem hingiv bide we, diyar e jar xistiyê, bi sond û sozên direwên eceman mexapin, ku

ger hezar carî jî dest li Qurana pîroz bixe û soz bide we, bi tenê niyaza wî xapandina weye, ji bo hîlekê li we bike.

Va me ez di demên dawî yên jiyana xwe de me, ji we re dibêjim û ji bo xatirê Xwedê yê mazin ez we şîret dikim ku a ji destê min hat bi ser can û tekoşîn, bi şîret û nîşandana riya rast; min ji we re xemsarî nekiriye, niha jî di vê dem û rewşê de dîsa ji we re dibêjim ku îdî bi eceman mexapin û ji sond û dest li Quranê xistin û ehd û peymanên wan bawer mekin, ji ber ne Xwedê dinasin û ne jî ji Xwedê û pêxember û roja qiyametê û hîsab û kîtaban bawer dikin, li cem wan bi tenê ji ber ku hun Kurd in, bila hun musilman jî bin, hun sûçdar û mehkûm in, hun ji wan re dujmin in, ser û mal û canê we ji wan re helal e û weke xeza qebûl dikin, soza min ne ew bû ez herim û we di destê van dujminên dilreş de bihêlim, min pir caran jî raborî û zilamên me yên mezin dihizirand, ên ku eceman bi xapandin û sond û direw û hîle ew girtine û kuştine, neçar bi direw û hîle ew xapandin e, kuştin e.

Ew tev li bîra min bûn û ti carî jî min ji eceman bawer nekiriye, lêbelê beriya ku vegerin vir, çendîn caran gotin û rasparin bi name û bi şandina kesên navdêrên Kurd û Fars, bi dayîna soz û ehdên yekcar pir û mezin ku niyaza xêrê ya dewleta ecem û Şah bi xwe jî heye û ne amade ne ku bi tenê dilopeke xwînê jî li Kurdistanê birije, niha hun bi çavê serê xwe encama sozên wan dibînin, ger mezinên hoz û eşîrên me îxanet nekira û xwe nefirotina hukûmeta ecem, weha nedihate serê me û we û Komara me jî.

Şîret û wesiyeta min ew e bila zaroyên we bixwînin, ji ber ti tiştê me ji yê gelên din ne kêmtir e, bi tenê xwendin nebe, bixwînin ji bo hun ji karwanê gelen paşve nemînin û her xwandin çeka kujeka dujminan e.

Piştrast bin û bizanin ger tebayî û yekbûn û xwandina we baş be, hunê pir baş bi ser dujminê xwe de serbikevin jî. Çênabe bi kuştina min û bi kuştina bira û pismamên min çavê we bitirse, tanî hin digîjin hêvî û meremên xwe; divê hê jî pir kesên din yên mîna me di vê rê de gorî bikin.

Piştrast im piştî me pir kesên din jî her wê bi xapandin û durûtiyê ji holê werin rakirin.

Piştrast im pir kesên ku wê piştî me jî bikevin xapandina eceman de; wê ji me zanatir û hêjatir jî bin, lêbelê hêvîdar im kuştina me ji dilsozên gelê Kurd re bibe pend û îbret.

Wesiyeteke din min ji were ew e daxwaz bikin her çiyê we ji bona serfiraziya gel kir, alîkarê we gel be, piştrast im Xwedê yê mezin wê we serbixe û wê alîkariya we bike, heye ku hun bêjin; lê çima ez serneketim?! di bersivê de dibêjim, bi Xwedê kim ez serketime, çi nîmetek, çi serketinek ji wê yekê

mezintir e ku va me ez niha di riya gel û welatê xwe de, ser û mal û canê xwe didim, bawer bin min pir ji dil dixwest ger ez mirim bi mergekî bimirim ku di hizûra Xwedê û resûlê Xwedê û gel û welatê xwe de rûsor bim, ji min re ev serketin e.

Xweştiviyên min, Kurdistan mala her Kurdekî ye, her wek di malê de; endamên malê her kesê ji her karekî dizane, wî dispêrin wî, îdî mafê ti kesî ti ne ku hesûdiyê pê bibe, Kurdistan jî her ew mal e, ger we zanî kesek li vê malê dikare karekî bike, dev jê berdin bila bike.

Êdî çênabe hun kevira danin ser riya wî û çênabe dilê we ji wê yekê bêşe ku berpirsyariyên mezin di destê yekî ji we de hene, ger karên mezin ketin ser milê yekî û ew kar bi rêve bir, welê diyare jê dizane û berpirsiyariyên wî yên mezin jî li hember wî erkî hene. Piştrast be birayê te yê Kurd her ji dujminê dil bi kîn baştir e û ger berpirsiyariyên mazin li ser milê min nebûna, niha ez di bin darê sêdarê de neradiwestiyam, lewra çênabe hun bi hev re temahkar bin, ên ku fermanên me pêk ne anîn, ne her bi tenê pêk ne anîna fermanan, lêbelê tam dujminatiya me dikir, ji ber me xwe wek xizmetkarê gelê xwe qebûl dikir, niha ew di nava mal û zarokên xwe de, di nava xwea şirîn de ne, lêbelê vaye li ser navê xizmeta gel di bin darê sêdarê de me û wa ezê demên dawî yên jiyana xwe bi vê wesyetnamê derbaz dikim. Ca ger berpirsyariyên mezin di sitoyê min de nebûna, ez jî wê niha di nava zarok û zêçiyên xwe de di xewa şirîn de bûma, ku ez niha ji bo piştî çûyîna xwe jî we şîret dikim, ew jî yek ji berpirsyariyên di sitoyê min de ye, piştrast im ger yekî din ji we berpirsiyariyên min bigirtana sitoyê xwe, niha ewê li şûna min di bin darê sêdarê de bûya, ji bo radîbûna Xwedê û li gor berpirsyariya di sitoyê xwe de mîna Kurdekî xizmetkarê gel û di riya çakiyê de, min ev şîret li we kirin ku hêvîdarim ji niha pê ve pendan jê wergirin û dirust guhdariya şîretên min bikin, bi hêviya Xwedê yê mezin we bi ser dujminên we de serbixe.

1- Baweriya we bi Xwedê û tiştê li cem Xwedê tê û peristina Xwedê û pêxember (silavên Xwedê lê bin) hebe, di pêk anîna erkên Olî de xurt bin.

2- Yekîtî û tebayiya di nava xwe de biparêzin, karê neqenc li hember hev mekin û temah mebin, bi taybetî jî di berpirsiyariyê û xizmetê de.

3- Xwendin û zanist û pileya zaniyariya xwe pêşve bibin ji bo dujmin kêmtir we bixapîne.

4- Ji dujminan bawer mekin, bi taybetî jî dujminên ecem, ji ber bi çend awa û riyan ecem dujminên we ne, dujminê gel û welat û Ola we ne. Dîrokê selmandiye ku berdewam ji Kurdan bi behane ne, bi kêmtirîn tawanê we dikujin û ji ti tawanan di derheq Kurdan de destê xwe nagirin.

5- Ji bo hin rojên jiyana bê qîmeta vê dinê, xwe mefiroşin dujminan, ji ber dujmin dujmin e û ne cihê pêbawerbûnê ye.

6- Îxanetê li hev mekin, ne îxaneta siyasî û ne giyanî û malî û ne jî ya namûsî, ji ber îxanetkar li cem Xwedê û mirovan jî sivik û sûçbar e, îxanet li îxanetkar vedigere.

7- Ger yekî ji ve dikaribû karên xwe bê îxanet pêk bîne, pê re alîkarî bikin, ne ji ber temahî û bexîliyê li dijî wî derkevin, yan Xwedê neke li ser wî bibin sîxurên biyaniyan.

8- Cihên ku min di wesiyetnameyê de ji mizgeft û nexoşxane û dibistanan re nivîsandiye, hun tev daxwaz bikin ji bo pêk werin û mifa jê bigirin.

9- Hun ji xebat û hewl û tekoşînê ramewestin ji bo mîna tev gelên din ji bin destê dujminan rizgar bibin, malê dinê ne tiştek e, ger welatê we hebe, serbestiya we hebe, wî çaxî her tiştê we heye, hem mal, hem serwet, hem dewlet, hem rûmet û hem wê nîştimanê we jî hebe.

10- Ez nebawer im, heqê Xwedê nebe, ti heqên din li ser min hebin, lêbelê ger kesekî welê dît ku kêm yan jî pir tiştikî wî li cem min e, min malekî pir hiştiye, bila biçe ji warisên min bixwaze û wergire.

Tanî ku hun hev negirin, hunê sernekevin, zilm û zorê li hev mekin, ji ber Xwedê pir zû zalim ji holê radike û nabûd dike. Ew soza Xwedê ya bê kêm û zêde ye, zalim dirûxiyê û nabûd dibe, Xwedê toleya zilmê jî hil tîne.

Hêvîxwaz im wan gotinan têxin guhê xwe û Xwedê we bi ser dujminên we de bi ser bixe, weke Sedî Kerem kiriye:

Muradê ma nesîhet bûd û gufîtm

Hewalet ba Xuda kerdîm û reftîm

Ango: Mirama me şîret bûn û me kir, me hûn rasparin Xwedê û em çûn.

Xizmetkarê gel û welat

Qadî Mihemmed

Di pêş sibêdeya 10’ê Xakelêweya sala 1326(30.03.1947)’an de, Pêşewa Qadî Mihemed, Mihemed Hesen Xanê Seyfê Qadî(kur mamê Pêşewa) û Ebulqasim Sedrê Qadî(birayê Pêşewa) piştî hukim dan li du dadgehên neadilane û rûyekî de bi destê gemar û qirêj yê neyarên gelê Kurd li Çar Çiraya bajarê Mehabadê, yanî her li wî cihî de ku li 2’ê Rêbendana 1324(22.01.1946)’an de

Komara Kurdistanê tê de hatibû ragihandin, hatne darvekirin û şehîd bûn, û her di vê rojê de li ser milê xelkê bi emeg û bi şeref yê Mehabadê di goristana Mela Camî de hatine veşartin.

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê li 10'ê Xakelêweya sala 1358 (30.03.1979)'an ev roje weke Roja Şehîdên Kurdistanê îlan kir. Heke di pêş wê demê de li ber zext û givaşên kirêgirtiyên Şahê dîktator, azadiya lidarxistina rê û resmê bi vê hincetê nebû, lê piştî hilweşîna rejîma Paşayetiyê û bi taybet piştî wê ku PDK Îranê ev roje bi vî navî nasand, hemû salê di roja han de rêz û hurmet ji hemû şehîdan û pêşengê wan Pêşewa Qadî Mihemed tê girtin.

Rast e Pêşewa Qadî Mihemed Serok Komarê Kurdistanê û kesayetiyê herî navdar yê Mukiryanê bû û di hemû deveran de naskirî bû. Lê piştî derbasbûna çend salan li ser şehîdbûna wî jî ji bo gelê Kurd bi awayê hewce nehatibû naskirin, yan jî heke naskirî ba, mîna dema niha ku rêz û hurmet jê tê girtin, qedir lê nedihate girtin. Hewce ye gelek pitir ji vê hindê lêkolîn li ser kesayetiya Pêşewa bihê kirin, heta bi vî awayê ku hêjayê wî ye, bihê nasandin.

Qadî Mihemed kurê Qadî Elî yê kurê Mîrza Qasimê Qadî ye. Derbasbûyiya vê malbatê li bajarê Sablaxê bi 400 salan berî niha vedigere. Ew ne tenê ji aliyê xelkê ve, belkî ji aliyê desthelatdar û berpirsên hikûmetî jî ciyê rêz û hurmetê bûn.

Qadî Elî bavê Pêşewa, li sala 1930'an li Mehabadê de Rêxistineke kurdî bi navê "Bizava Mihemed" pêk anî. Navhatî tevî şoreşa Şêx Mihemed Xiyabanî di Tewrêzê de têkilî hebû, heta sala 1934'an jî ku koça dawiyê kir, li ser vî karî berdewam bûye. Qadî Elî xwediyê du zarokan bûye, yek ji wan Ebulqasim Qadî naskirî bi Sedrê Qadî bûye ku yek du geran ji aliyê xelkê ve bûye nûnerê Parlemanê û hitbar û nifûzeke taybetî hebûye. Piştî bi dawî hatina dewrana nûnerayetiya xwe, li ser pêşniyara Pêşewa, bo cî bi cî kirina kar û barên siyasî û hevkarî kirin tevî xelkê her li Tehranê mabû.

Qadî Mihemed jî ku di sala 1900'an di vê malbata qedirgiran û bi ferheng de ji dayîk bûye, her li destpêka ciwaniya xwe de hizr û hesta nîştimanperweriyê tê de xurt bûye, pir hez ji xwendina zanista kevn û taze hebûye û gelek zû di vî warî de pê elimiye û gelek cehd kiriye ku zimanên biyanî ji hîn be. Ji bilî zimanê Erebî, Farsî û Kurdî, tevî zimanê Fransî, Îngilîzî û heta qasekê Rûsî jî nasyarî hebûye.

Qadî Mihemed gelek hez bi hatin û çûn û têkilî tevî alîgirên zanistê û şareza û Mêrxasan, Kurdên Welatperwer û Serok hoz û eşîran hebûye. Piştî mirina babê xwe bûye dadmendê bajarê Mehabadê. Li ber hezkirina zaf bi karê çandî û pêşdebirina zanist û agahiya xelkê, di salên beriya sala 1941'an û piştre jî bo yek du salan berpirsyariya îdareya çand ya bajarê Mehabadê li stû girtiye û

xizmeteke zaf ya çandî kiriye. Li dema berpirsyariya wî de, yekemîn xwendingeha keçan li Mehabadê hatiye vekirin. Her di vê derheqê de tevî zaf ji xwendekar, rewşenbîr û mamostayan de pir nêzîk bûye.

Qadî Mihemed rêz û hurmeteke xasmanî ji bo damezirînerên Komeleya J-K (Vejiyana Kurd) hebûye. Di çend salên dewrana bê hikûmetiyê de jî yanî salên 1941-1945'an ku Komara Kurdistanê pêk hatiye, di birêveçûna kar û baran de û nemaze di çareserkirina pirsgirêk û arîşeyên eşîreyan de roleke berçav hebûye. Gelek ji demezirînerên J-K'ê rawêj û şêwir tevî Pêşewa Qadî Mihemed kirine û gelek jê hez kirine û zor hewil didan ku bibe endamê "J-K"ê. Gelek ji pirs û arîşeyên karî ên rojaneye xelkê li dîwana wî de ku jêre digotin "Mehkeme" dihatne çareser kirin.

Qadî di ditîngeha nûnerên biyaniyan jî ku wê demê welatê Îranê di navbera xwe de parve kiribûn, rêz û hurmeteke taybetî hebû. Her kes ji bo Mehabadê çûye, cehd kiriye berê her kesekê wî bibîne. vexandina wî ji bo Yekîtiya Soviyetê her di vê derheqê de bûye, ku bi şandeke mezin re çûye Bakoyê. Qadî Mihemed ku bû bi endamê "Komeleya J-K" û navê nepenî yê Bînayî jêre hate diyarî kirin, hêviyek zêdetir xiste nav dilê gel û berpirsan de.

Di encama têgihîştina bi wext û cesûriya siyasî ya wî û bi qinaet gihîştina (qebûlkirina) berpirsên Komeleyê de bû ku J-K bû bi Partiya Demokrat a Kurdistanê û wek Partiyeke Demokrat û pêşverû dest da xebat û tekoşînê. Qadî ji ber hurmeteke taybet ku ji bo "J-K"ê hebû, roja avabûna PDK jî her bi 25'ê Gelawejê, roja avabûna "J-K"ê îlan kir û bi vî awayî bala piraniya berpirsan ji bo aliyê tekoşîn di nava PDK rakişand. Partiyê bi xurtî ta û çiq avêtin û tekoşîna wê di hemû deverên azad yên Kurdistanê de pêş ket. Partiya Demokrat pirsgirêka bi darê zorê zeliqandina Kurdistanê bi Azerbaycanê verevand û neçar kirin ku hesabeke cuda ji bo Kurdistanê bikin.

Piştî pêkanîna Kongireya yekemîn, li 2'ê Rêbendana 1324 (30.03.1946)'an de, bi pişikdariya nûnerên parçên din ên Kurdistanê û Mela Mistefa Barzanî û Serok Eşîr û nûnerên hemû cih û taxên Kurdistanê, pêkhatina yekemîn Komara Kurdistanê hate îlan kirin.

Ger heta vê gavê car caran di Rojnameya Kurdistan de qala navê Pêşewa dihate kirin, piştî damezirandina Komarê bi awayekî fermî nasnavê Pêşewa pê hate bexşîn û ew nave hetanî niha jî di nava kom û civatên xelkê de her meşhûr e.

Pêşewa mirovekî gelek bi ferheng, dilsaf, xweşqise, evîndarê wêje û hunerê, ravêjker, di heman demê de miroveke siyasî û demokrat, welatparêz û evîndarê gelê xwe bû. Tevî hemû tex û çînekê rabûn û rûniştin dikir(tevdigeriya) û li dema hewce de ji hest û qaweta wan mifah werdigirt.

Qadî Mihemed biratî û hevgirtina Kurdan sedemên herî mezin yên serkeftinê dizanî. Ji ber vê çendê ye ku di piraniya gotar û nivîsarên xwe de ku di rojnameya Kurdistan ya wî çaxî de hatine weşandin, li ser pirsa yekîtî û biratiyê tekez kiriye û wekî merca serkevtin û bingeha ragirtina Komar û sedemên serkeftina bi ser dujminên gelê Kurd de zaniye.

Her çiqas dizanî ku dujminên gelê Kurd rast nakin, lê di gutûbêjan de gelek bi aşkira radigehand ku gelê Kurd hez dike bi awayekî aştiyane bigihîjne mafên xwe, lê ger wisa nebe, ewa ji dest bê, dê bike.

Eva hewce bû bi aşkera û bêtirs ji Şah û Qawam re ragihand, tilî li ser kêmasiyên wan li hember gelê Kurd daniye û ji wan re destnîşan kiriye. Bi eşkere jî digot, hûn di gotinên xwe de du dil in û hez nakin pirsa gelê Kurdistanê çareser bikin.

“Necefqulî Pesyan” axavtinên Pêşewa li dadgehê di çend hevokan de kurt dike û dinivîse: “Li dema dadgehî kirinê de Qadî Mihemad êrîşê dike ser siyaset û kiryarên dewleta Tehranê û digot: “Ez di kuncê girtîngehê de dengê xwe bi dijî dewleta Tehranê û serokên wê bilind dikim û dibêjim hûn gunehbar in ne em, we welatê me dagîr kiriye”. Rojnamevaneke din bi navê Silêman. X di nivîsên xwe de dibêje, Qadî got: “Tevahiya ev serpêhat û bûyerane encama siyaseta dagîrker ya dewletê ye. Ger dewlet hemû Kurdan bi xayîn dizane, bila ji Kurdan vegerin, kar û barên xwe bi xwe bigirne destê xwe “.

Di girove, belge û rojnemeyên Yekîtiya Soviyet a berê de gelek tişt di derbarê vê mijarê de hatine nivîsîn û ji zimanê Efserên Îranê ve bas dikin ku Qadî gotiye: “Ev bûyerane di encama vê çendê de bûye ku we bi xwe Qanûna Bingehîn bin pê kiriye. Niha jî ez tenê bi xwe demokrasiyê di Kurdistanê de xurt dikim û pêşde dibim û tu hêzeke biyanî haydarê min nebûye. Bêpar bûna gelê Kurd yê bûye haydarê min ji bo birêve birina wan kar û xebatane.”

Dema ku serokê dadgehê yan Dozger wî bi îxanetkar gunehbar dike, di bersîvê de, Pêşewa dibêje: “Wira mala min e, axa Kurdistanê axa bav û kalên min e, ez çawan dikarim dest ji welatê xwe berdim.”

Ger yekemîn mehkeme di 19’ê meha Janviyê de dest pê kir û çend rojan dom kir û biryara Îdama Qaziyan da, mehkema duyemîn di 28’ê Marsa 1947’an yanî 7’ê Xakelêweyê dest pê kir û roja 30’ê Marsê dawî pê hat.

Kovara Xebata Xwendekaran hejmara 37’an di vê dawiyê de ji zimanê Serwan Kiyûmers Salihî, nûçegihanê Kovara Arteşê ku di dadgehê de bûye û piştre li ser nivîsîna raporekê di vê derheqê de tê girtin û salekê dikeve girtîngehê, çend hevok ji gotinên Pêşewa belav kiriye.

Pêşewa gotiye: “Min ji mêj dem e xwe bo vê yekê amade kiriye, ez bi sîngeke vekirî pêşwaziyê ji vê mirina serbilindane dikim ku di rêya azadiya netewa xwe de tême kuştin. Eva sozek e ku min ji neteweya xwe re daye ku tevî wan bijîm û ji wan re jî bimrim, taze ez dê çawa amade bibim peymana xwe bişkînim û binpê bikim.”

Her wiha Serwan Kiyûmers dinivîse: “Min di piraniya dadgehên meydanî û leşkerî de weke nûçegihan beşdarî kiriye, lê min qet tu kesek weke Qadî Mihemed biwêr û netirs nedîtiye. Wî di dema dadgehî kirinê de nedizanî tirs çî ye. Gelek mêrane û bêtirs qise dikir û bersîva pirsyaran dida.”

Her ev netirsî û xwe gorî kirina wî jî bû ku li jêr dara Îdamê rê neda çavên wî girê bidin û got: “Ez hez dikim di demên dawîn yên jiyana xwe de bi serbilindî û çavên vekirî binêrme welatê xwe yê ezîz û xweştevî.” Her wiha emir kir:

“Hûn Qadî Mihemedekê dikujin, lê bizanin li her dilopeke xwîna min Qadî Mihemedek dê şîn bibe. Ez daxwazê ji gelê Kurd dikim dest ji xebata xwe di pêxema azadiya Kurdistanê de ber nedin, baweriyê bi dewleta xwefiroş ya Tehranê nekin. Bijî Kurd û Kurdistan.”

Peyama Birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê Di Roja Şehîdên Kurdistanê De Hevwelatiyên birêz! Beşdarên rê û resma bîranîna 60’emîn salvegera şehîd bûna Pêşewayê Kurd,

Qazî Mihemed!

Li 10’ê Xakelêweya îsa de, 63 sal bi ser şehîd kirina Pêşewa Qazî Mihemed û hevalên wî re derbas dibe. Pêşewa Qazî Mihemed bi avakirina PDK Îranê û bi sedema vê partiyê jî, avakirina yekemîn Komara Demokrat a Kurdistanê, şanaziyekî mezin li dîroka xebata rizgarîxwaziya gelê Kurd de bo xwe û Partiya xwe tomar kir. Wî li midehê yazdeh mehên avabûna Komara Kurdistanê de

nîşan da ku rêberekî demokrat û bê mînak yê serdemê xwe ye. Wekî Dr. Qasimloyê nemir li pirtûka "Çil Sal Xebat li pêxema azadiyê de" nivîsandiye ku **Pêşewa gulek bû ku li nava deşt û çolekê de şîn bibû**.

Berpirsiyarên rejîma Paşatiyê û dujminên maf û azadiya gelên Îranê piştî hiloşîna Komara Kurdistanê li roja 30'ê Sermaweza sala 1325'ê Rojî de, heya roja lidarvekirina wî li 10'ê Xakelêweya 1326'ê Rojî de (30.03.1947), bi dana gelek qewl û sozan cehd kirin heta ku Qazî Mihemed razî bikin daku bibêje ji kiryarên xwe peşîman e. Lê Pêşewayê nemir tevî wê ku dizanî bersiva red û nerênî bi rejîma Paşatî, bi fermayişî hesiband. Berevaniyên Pêşewa Qazî Mihemed pêtir li wî warî de cihê baldan û heyrîmanê ne ku li vê dadgehî kirinê de li cihê berevanî kirin ji xwe, berevanî ji xwast û daxwazên gelê Kurd dikir û bi heq wî ev erk û rol zor bi başî dirêve bir. Li encam de bi van berevaniyên netirsane yên xwe ders û şîretek binirx û ceribînek baş bo xebatkarên rêya rizgariyê piştî xwe bi cih hişt. Wî dersa wefadarî û emgedariyê bi armanc û kornoj nebirin bo dujmin hînî rêvîngên rêya xwe kir ku bi xweşî ve qotabiyên wî baş hîn bûne û li jiyana şoreşgeriya xwe de bi başî bikar anîne.

Serencam li roja **10'ê Xakelêweya 1326'ê Rojî (30.03.1947)'an de, Pêşewa Qazî Mihemed, Seyf û Sedr Qazî li meydana Çarçiraya Mehabadê de hatin darvekirinê**. Her li vê pêwendiyê de berê jî komek din jiwan wekî "Feyzolabegî" hatin îdam kirin. Rast e dilê wan li wê rojê de li Kotanê ket, lê heta hetaye dê li nava dilê bi kul yê neteweya xwe de bimînin û armanca wan, rêbaza bi Milyonan Kurd e. Piştî şehîdbûna Pêşewa, rêvîngên rêya wî û xortên bicerg û netirs yên vî gelî rêya wan domandin û xebata bo azadiya gel li bin rênimayî û rêveberiya Partiya jêhatî û demokrat a Pêşewa de herweha dom kir. xebatkarên Partiyê tevgera 46 – 47'ê bi qasê 18 mehan birê xistin. Tevgera 46 – 47'ê zengekî bitirs û xeter bo rejîma paşatiyê û hişyarkarê xebatkarên rêya azadiyê bû.

Zenga xeterê bo rejîmê, bona wê bû ku bi rejîma şa bide selimandinê ku dîktatorî û zext û givaş heta heta nabe, dengê hişyarkar bo xebatkaran jî bona wê bû ku bide selimandinê rejîma paşatiyê ew rejîma giran û qahîm nine ku nehê hejandin. Li bizava 46 – 47'an de jî herçiqas ku hejmarek ji baştirîn xortên gelê Kurd şehîd bûn, lê wan bi xwîna sor a xwe dara Ger Pêşewa hat şehîd kirinê, Dr. Qasimlo hate meyandin û tekoşîn û xebata nepenî a xwe li nava dilê rejîma bikojê Qaziyan dedomand û xew ji çawê şewperest û dijî geliyan herimand. Komek ji azadiyê têr av kirin, daku rojekê ber û berhemê bigire û gel li bin sîbera wê de vehesiyên. Piştî tepeser kirina tevgera 46 – 47'ê jî xebat ji bo gihîştin bi azadî û mafê gel her berdewam bû, taku serencam gelên Îranê li 22'ê Rêbendana 1357'ê Rojî de tomar û bar û binegên reş û tejî ji cinayetên rejîma Paşatiyê ji holê rakirin. Piştî hiloşîna rejîma şa, rejîma Komara Îslamî cihê wê girt. Rejîmek ku ol û meseb xiste xizmeta siyasetên dijî mafên neteweyî

û demokrasiya rejîma berê û bi wî awayî jî rewatî û meşrûiyetekî ayînî bi xwînrêjiyên xwe bexşî. Lewere em dibînin ku karwanê şehîdên me li vê heyamê de dirêjtir bûye û heya niha jî herweha didome. Li pêşiya vê Karwanê de jî Dr. Qasimlo û Dr. Seîd û gelek rêber û serokên jêhatî yên dinê yên qada xebata dijî bê serûberî û serberedayiya li Kurdistana Îranê de diyar in ku bi fermana desthilatdarên Hikûmeta Îslamî xwîna wan hatibû helal kirin. Hemû ew şehîdane rêvîngên rêya Pêşewa ne, rêya serbilindî û şerefê, rêvîngên ku li bin siya fidakariya wan de, neteweya me li bi pîlan û givaşên dujminan de neheliya û bi şanazî ve bi domandina xebata netewayetiya xwe bûye bi çiql û qelema çawê dujmin û neyaran. Piştî borîna 60 salan bi ser bûyera şehîdkirina Pêşewa Qazî Mihemed û piştre jî şehîdên tevgera 46 – 47'ê û dehan hezar şehîdên qonaxa dawîn ya Şoreşa gelê me pêkhatî ji rêber, kadr û pêşmerge û xelkê sivîl, pêvajoya xebata gelê Kurd her berdewam e û xebata neteweyî ya gelê me li pêxema maf û azadiyên wê de roj bi roj serkevtinên pêtir tomar dike. Li hemû parçên din yên nîştimanê Kurdan (Kurdistanê) de xebat roj li pey rojê pêtir geş û xurt dibe. Heta ku diçe Kurd baştir li bîr û raya giştî ya cîhanî û kom û komeleyên navneteweyî de wekî neteweyek mafxwaz û demokrat tê nasînê û dost û hevalên zêdetir peyda dike. Hemû ew fîdakarî û tekoşîna xortên welatparêz û biwêr yên Kurd e ku ev gotina binirx ya Pêşewa tîne bîra me ku li dema dadgehîkirina li bêdadgeha şa de got: **Hûn** nirxa canê wî xilas dibe, lê dîsan jî bersiva red da û li hemberî xwestekên wan de stû xwar nebû.

Pêşewa li midehê dadgehîkirina di bêdadgeha leşkerî de zor biwêr û netirsane li hemberî bêdadgeha rejîma Paşatiyê de rawestiya û berevanî ji armancên gelê Kurd kir. Li rastî de Pêşewa bû ku bêdadgeha leşkerî a Paşatiyê kire hola dadgehî kirina rejîma dijî gelî û serberedayî a Paşatiyê. Li pêvajoya dadgehê de, li hemberî bêhurmetî û sivikatiyên dadverên dadgeha leşkerî bi gelê Kurd re, Pêşewa çend caran êrîş kire ser wan û dadgeha wan bi dadgeheke

Agirî, hejmar 60, 31'ê Adara 2007 SIYASÎ bi kuştina min Qazî Mihemedekê dikujin, lê piştî min her keç û xortekî vê Kurdistanê Qazî Mihemedek in û dê xebatê heya gihîştin bi azadiyê bidomînin". Xûşk û birayên birêz!

Berxwedaniya xortên gel, bûye sedema wê ku ne tenê hêviya dîktatoran ku helandina neteweya Kurd li nav neteweyên Fars, Turk û Ereb de bû, bi ci nehêt, belkî ji aliyekê ve encama xwîna şehîdan, nerawestiyan û bi çoknehatina berxwedaniya gel, ji aliyê din ve jî guhertinên li cîhan û deverê de, bûne sedem ku li vî serdemî de dîktator ber bi lawazî û nemanê ve biçin û neteweyên bindest û zulmlêkirî yên deverê û yek ji wan jî neteweya Kurd ber bi geşandin û serkevtinê gavan bavêje. Dîktatoriya Bexdayê hiloşiya, Kurdên vê parçeyê bi parek ji xwest û daxwazên xwe gihîştin. Li Turkiyê serbarê hemû zulm û

komployên desthilatdarên Kemalîzmê li dijî gelê Kurd, berxwedaniya vê gelî xurttir dibe û dibîte mijarek navneteweyî.

Hikûmeta Paremayî ya Komara Îslamî a Îranê ne tenê her nekarîn bi teror kirina bi sedan rêber û xebatkarên Kurd hewara mafxwaziya Kurdan li vê beşê de bêdeng û bifetisînin, belkî îro keç û xortên vî parçeyî ji welat, netirsane û biwêranetir ji caran dijatiya kirêgirtiyên rejîmê dikin.

Rejîma Komara Îslamî pêtir ji salên borî li dest kirîzên hundirîn û derveyî yên ku bi xwe afirandine, dinalîne. Biryara sêhemîn a cezadana Îranê ji aliyê Konseya Ewlekar ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî li ser domandina bernameyên navikî ji aliyê rejîma Îranê ve, û tekez û pêdagiriya rejîmê li ser guhnedana bi xwasta civaka navneteweyî, çarenivîsa xelkê Îranê bi pêşerojeke tarî û nediyar re berbirû kiriye.

Li Sûriyayê de jî gelê Kurd hin deskevtên siyasî bidest xistine û serbarê givaş û zextên Hikûmetê, gelê Kurd li vê parçeyê de jî xebatê bi awa û metoda xwe pêşve dibe. Girîng eva ye ku li bin giranî û qorsayiya kuştin, helandin û şewitandina xak û nîştimanê xwe de serbilind derketiye û dîroka sedsala borî ku rojên herî reş, tal û bitirs yên dîroka Kurdan bûn, bihorand. Niha xortên Kurd, zîndî û hişyarane dengê mafxwaziya xwe digihîjînin guhê dunyayê. Diyrarde û berçawiyên vî serdemî wekî bicîhanîbûn û pêwendiyên lezgîn, çi din rê nadin ku dîktator li bêdengiyê de Kurdan qir bikin û nehêlin ku deng û hewara wan guhê kesê re bigihîje.

Eva jî li bin siya qorbanîdan û fîdakariya bi sedan hezar şehîdan de bûye ku li pêxema zindî mana neteweya xwe de, li bextkirina canê xwe ku şirîntirîn û pirbehatirîn heyîna wan bû, qisorî nekirin. Nexa renge wekî ku hêviya dujminên Kurd bû û jêre pîlan dirêtin, Kurd heliyaban û negihîştibane vî serdemî, herwekî wê ku bi ser zaf neteweyên din di vê midehê de hatiye. Lewra bi cih e ku li vê rojê de tevî kirnoj birin bo canê pak yê nemir Qazî Mihemed, serkarwanê şehîdên Kurdistanê, Sedir Qazî, Seyf Qazî û şehîdên Feyzola begî ku piştî hiloşîna Komarê hatin şehîd kirinê û Dr. Qasimlo, Dr. Şerefkendî û hemû şehîdên rêya rizgariya Kurdistanê peymanê nû bikin ku heta gihîştin bi armancên bilind yên wan şehîdan ku armanca neteweya Kurd e, rêvîngên biwefa û emegdar bi rêya wan bin. Çimkî bi gotina Dr. Qasimlo, **baştirîn xelat bo şehîdan, dirêjedana rêya wan e. Bila em hemû bihevre silavên emegnasî û rêzgirtinê ji hemû wan malbatan re bişînin ku xweştiviyên xwe li rêya rizgarî û serbilindiya Kurdistanê de ji dest dane û emegdar in bi rêbaza xwe.**

Silav ji zîndaniyên siyasî yên Kurdistanê ku li rêya armancên Pêşewa û daxwazên rewa û berheq yên wan bo azadî û wekheviyê li girtîxaneyên Komara Îslamî û dîktatorên deverê de ne.

Silav li jin û mêrên Kurdistanê ku li hemberî zext û givaş û tepeserkirina rejîma serberedayî û dijî mirovî de, qehremanane berevaniyê ji man û heyîna xwe dikin û bi çok de nahên.

Îlankirina Tekoşîna Aşkera Ya PDK Îranê[3] Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê ku piştî hiloşîna Komara Kurdistanê bo dema 32 salan tekoşîna nepenî hebû. Aqibet di roja 11'ê de hêza tepeserker a xelkê bûn, nabe careke din bihê organîzekirinê, belku divêt erka parastin û ewlekariya Kurdistanê bi destê xortên gelê Kurd bê dan. Di vê civînê de bû ku Dr. Qasimlo ragihand, her kes dijminê me nebe, em hesaba dostî li ser dikin û got nabe em hêzên xwe li dijî hev bikar bînin, belku divêt hevxebat bin û ji bo pêşvebirina armancên xwe hînî demokrasiyê bin.

Dr. Qasimlo di hevpeyvînekê de tevî Rojnameya "Etlaat" ya roja 16.12.1357 (07.03.1979)'an, yanî pênc roj piştî ragihandina tekoşîna aşkere ya partiyê di bersiva pirsekê de ku li ser mafê diyarîkirina çarenivîsê ji wî tê kirin, dibêje: "Em daxwaza dewleteke federal dikin û divêt hemû gelên Îranê mafê diyarîkirina çarenivîsa xwe hebe û ragihand, bê hebûna demokrasiya rasterast û avakirina dewleteke federal di welat de, mafê neteweyî yê gelê Kurd dabîn nabe.

Di bersiva pirseke din ku jê tê pirsînê, gelo tu bêjî otonomiya daxwazkirî nebe sebebê cudabûna Îranê? Dr. Qasimlo dibêje: "Ez berevajî gotina we difikirin, pêkhatina otonomiyê û dana mafê neteweyî yê gelê Kurd yekîtiya rasteqîne ya gelên Îranê xurt û qahîmtir dike". Eva beşek ji wan dîtin û nêrînan in ku li 11'ê Reşemeya sala 1357'an, di destpêka ragihandina xebata aşkere ya partiyê hatibûn îlankirinê.

Reşemeya sala 1357 (02.03.1979)'an di mîtîngeke dehan hezar kesî de li bajarê Mehabadê, tekoşîna aşkera ya xwe ragihand. Xelkê seranserê Kurdistanê bi hez û hogiriyek zaf bo roja diyarîkirî xwe gihîjandine bajarê Mehabadê û di civîna îlankirina tekoşîna aşkera ya partiyê de beşdarî kirin. Rojên beriya destpêkirina civînê, xelk deste deste digîhiştine bajarê Mehabadê û ji aliyê desteya pervekirina mêvanan ve bi ser malên bajêr de ku "Kax Cewanan" (Qesra Ciwanan) ya wî bajarî de nîştecih bûn, piştî pêşwazîlêkirinê, dihatin parvekirinê. Di vê derheqê de xelkê dilsoz û xebatkar yê Mehabadê mêvandariyek baş ji mêvanan kirin., Sibêdeya Roja 11'ê Reşemeyê (2'ê Adara 1979'an) civîneke dehan hezar kesî di yarîgeha wî bajarî de ku hejmarek zaf ji rojnamevanên

[3] hejmar 59, 15'ê Adara 2007 Îlankirina Tekoşîna Aşkera Ya PDK

navxweyî û biyanî tê de beşdar bûn, dest pê kir û piştî xwendina sirûda
Rejîma kevneperest ya Komara Îslamî di dema van 28 salên borî de li ciyê gavavêtin bo dabînkirina mafê

Dr. Qasimlo, Mîtînga Mehabadê – 1979 Ey Reqîb û rêveçûna taybet (rêje) ya hêza Pêşmerge, şehîdê nemir Dr. Qasimlo, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê axivî û bername û tekoşîna aşkere ya partiyê ragehand ku naveroka vê bernamê pêkhatiye ji:
1. Xebat ji bo avakirina rejîmeke demokratîk di Îranê de.
2. Bidestveanîna mafê Otonomiyê bo hemû gelên Îranê di çarçoveya yek welat de û bidestveanîna mafê demokratîk bo hemû girûp û desteyên siyasî.
3. Berçavgirtina siyaseteke aborî ku berjewendiyên zehmetkêşan li berçav bigire û bingeha jiyana xelkê jorde bibe.
4. Jinavbirina ne xwendewariyê, jordebirin û xurtkirina çanda civakî ya xelkê di çarçoveya zimanê dayîkê ya gelên Îranê.
5. Pêşgirtina siyaseteke serbixwe û neteweyî li dijî Emperyalîzmê û piştevanî ji bizava rizgarîxwazî ya gelan.
6. Damezirandina pêwendiyan tevî hemû welatan li ser bingeha rêzgirtina hember hev û rêzgirin ji desthilata navxweyî û destvernedana di kar û barên hevdu de. Xêncî wan şeş xalane, li ser vê rastiyê îsrar kir ku hêza Jandermerî û Şaredariyê ku di dema derbasbûyî neteweyî yê gelên Îranê û çareserkirina doza Kurd di rêya aştîxwazane de ku partiya me xebateke zaf di vê rêyê de kiriye û çend car bo bas li ser doza Kurd tevî berpirsên taze bi desthilatgihîştî çûye Tehranê, bo mînak di roja 04.04.1358 (25'ê Nîsana 1979'an) şandeke payebilind ya Partiya Demokrat bi rêberiya Dr. Qasimlo çû cem Xomeynî û xwastên gelê Kurd tevî navhatî xistne ber basê. Lê Xomeynî di bersiv de basa parastina "Wehdetê Kelême (hevdengî)" yê kiribû û gotibû ez hêvî dikim, di pêşerojê de me mafê wekhev hebe. Biîsrarbûna Partiya Demokrat li ser çareserkirina doza Kurd ji rêya aştîxwazane ve kar gihîjande ciyekê ku kevneperestan bi lêban û hêceta çareserkirina doza Kurd li Kurdistana Îranê ji rêya aştiyê ve, Dr. Qasimlo kişande Viyenê û li ser maseya gotûbêjê şehîd kir û piştî wî jî, Dr. Seîd

Dr. Qasimlo di hevpeyvîn tevî Rojnameya Îtilaat, bervara 07.03.1979: "Em daxwaza dewleteke federal dikin û divêt hemû gelên Îranê mafê diyarîkirina çarenivîsa xwe hebe û ragihand, bê hebûna demokrasiya rasterast û avakirina dewleteke federal di welat de, mafê neteweyî yê gelê Kurd dabîn nabe"

Şerefkendî teror kirin. Rejîma kevneperest û totalîter ya Komara Îslamî li ser vê baweriyê bû ku bi kuştina Dr. Qasimlo û Dr. Seîd û hevalên wan dikarin Partiya Demokrat Lawaz û bêhêz bikin û ji nav bibin. Piştre jî bi domandina siyaseta tepeserkirin, zext û givaş û darêtina kompiloyên cur bi cur bi armancên

xwe negihîşt. Piştî 28 sal ji hatine ser kar ya rejîmê û ragihandina tekoşîna aşkera ya partiyê, em dibînin ku daxwazên wî serdemî her li ser ciyê xwe ne û heya niha jî tevî şehîd bûna hezaran kes ji Pêşmergeyan û dehan hezar kes ji xelkê sivîl û bêguneh yê Kurdistanê di vê pêxemê de, ev armanc bicî nehatine û xebat ji bo gihîştin bi van armancan herwisa di şêwazên cur bi cur de didome.

Piştî wî heyamê, niha pêşeroja xebata gelê Kurd ji hemû aliyekê ve rohn û roj bi roj hêvî bi serkevtinê di nava civatên xelkê Kurdistanê de xurt û bihêztir dibe.

Li hundirê welat de jî, ji aliyekê xortên gelê Kurd û ciwanên xwedî hest gelek baş bi maf û azadiyên xwe agehdar in û ji bo bidestveanîna maf û azadiyên xwe amadeyî her cure fîdakarî û xwegorîkirinekê ne û ji alîyekî din ve, rejîma kevneperest roj bi roj di civaka Îranê bêpar û nesîb dibe û kirîz û qeyranên cur bi cur ser heya pêyê rejîmê girtiye û heke em nebêjin hetine der ya rejîmê ne mimkin e, di vê em bibêjin pir dijwar e.

Di nav civaka navneteweyî de jî, xelkê Kurdistanê ji 28 salên borî zêdetir hatiye naskirinê û cewher û naveroka rejîmên dîktator û totalîter yên desthilatdarên Kurdistanê bo civaka navneteweyî rohn bûye û niha êdî di hemû cîhana pêşkevtî de Kurd wek neteweyekî aştîxwaz û demokrat ku xwedî axek dewlemend û nifûsek zaf ku heya niha jî bêdewlet tê mêzekirinê û ji daxwaziyên wan piştevanî tê kirin, niha êdî wek 28 salên berê nine ku tenê Parçeyên Kurdistanê piştevanê me bin, belku Kurdan gelek dost di cîhanê de peyda kirine ku piştevaniyê jê dikin û ji aliyeke din ve di beşek ji Kurdistanê de Kurd bi mafê xwe dilxweş bûye û xwediyê dewlet û desthilata xwe ye.

Dimîne eva ku em carek din li ser daxwazên demokratîk û rewa yên xwe ku anîna ser şola rejîmeke demokratîk û federal ku tê de mafê neteweyên Îranê bê misogerkirin, biîsrar bin û daxuyaniya cîhanî ya mafê mirovan wek bingeh bihê mêzekirin. Bidestveanîna vê armancê bi yekgirtina opozîsyona demokrat ya rejîmê cî bi cî dibe. Ceribînên derbasbûyî ji me re dibêje “Wehdeta Kalême” (hevdengî) yan hemû bi hevre bi bê diyarîkirina mekanîzmeke jêhat û di bername û pilatformeke demokratîk de li gorî van pîvanan ku me bas jê kir yanî anîna serkar ya rejîmeke demokratîk û federal ku tê de mafê gelên Îranê dabîn bike, mafê mirovan, demokrasî û sekolarîzm bingeha eslî ya rejîma pêşeroja Îranê be cî bi cî dibe.

Dr Ali KILIC, Paris 22 çelé 2009